

## XELKÊ 5 PARÊZGEHÊN ÎRANÊ BÎ PIRSGIRÊKÊN TEQÎNA MAYÎNAN RE DÎNALÎN

► Civata paqjîkirina mayînan li Îranê, bi hilkevta 4'ê Nîsana 2009'an, Roja Navneteweyî ya xebat li dijî mayînan diyar kir, zêdebarê derbazbûna 20 salan bi ser bidawîhatina şerê 8 salî yê Îran û Îraqê, hêşta xelkê niştecih ên 5 parêzgehên Îranê: Kurdistan, Îlam, Kirmaşan, Azerbaycana Rojava û Xozistan dibin goriyên teqîna mayînan û mayînen bicî mayî berdewam canê mirovan distînin yan welatîyan nivîşkan dikin. 4 ji van parêzgehên ne paqjîkirî ji mayînen bicîmayî ên serdemê şer, parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê pêk tînin.

Di daxuyaniya vê saziyê de hatiye ku hêj mayîn xetereke mezin in ku gefê li jiyana mirovan dikin û di van pênc parêzgehên rojavayê Îranê de ne tenê jiyana rojane a xelkê niştecih ê van herêmane tal kirine û rojane berdewam goriyan digirin, belkî cihê kar û jiyana xelkê jî bê ewle kiriye û nigeraniyek zaf di vê derbarê de heye.

Daxuyaniya rêxistina han kêmkarî û xemsariya karbidestên dewleta Komara Îslamî a Îranê di vê derbarê de rexne dike û destnîşan dike ku di van 20 salên borî de dewleta Îranê bi awayê hewce bala xwe nedayîye paqjîkirina mayînen çandî li

van 5 parêzgehên Îranê ku 4 ji wan Kurdakincî ne. Tê texmînkirin ku di van 5 parêzgehên Îranê de zêdetirî 16 milyon mayîn hene.



## Zêdetirî 200 Kes Di Operasyonên Li Dijî DTPê De Hatine Girtin

► Piştî derkevîna encama hilbijartinan li Turkiyê û serkevîna mezin a DTP'ê li Kurdistanê, ji aliyê hêzên dewleta Turkiyê ve operasyonêke berfireh a girtina endamên DTPê û çalakên siyasî ên kurd dest pê bûye û hata niha zêdetirî 200 kes hatine desteserkirin. Malpera farsî a BBC'yê ragihand ku çend endamên payebilind yê mezintirîn partiya siyasî a kurdên Turkiyê (DTP) di nav girtiyan de ne weke: Selma Îrmak, Kamuran Yuksek û Bayram Altun.

Partiya Civaka Demokratîk(DTP) girtina endamên xwe ji aliyê dewleta Turkiyê ve mehkûm kir û ragihandîye ku piştî vê yekê ku partiya AKP'ê li deverên kurdakincî di hilbijartinan de bi awayekî pêwîst deng neaniye, dewlet dixwaze wê partiye lawaz û bêhêz bike. 3 nûnerên parlemana Turkiyê ser bi DTP û du parêzerên Abdul Ocalan, serokê PKK'ê yê girtî, di nav girtiyan de ne.

Ehmed Turk, serokê DTP'ê di axavtinekê de li parlemana Turkiyê, serbarê mehkûmkirina vê kiriyara dewleta Turkiyê, serokwezîrê Turkiyê bi hewildan bo tohildan ji DTPê tometbar kir. Navhatî her wiha daxwaza ragirtina çalakîyên eskerî kir û got ku divê endamên DTP'ê zû serbest bihên berdan.

Siyasetvanên kurd li Turkiyê berdewam bi piştevanî ji PKK tînin tometbarkirin û heya niha çendî car çalakyên partiyên kurdan li Turkiyê hatiye qedexekirin.



Aloziyên Nû Di  
Pêwendiyên  
Îran û Mîsrê

3




Tirsa Ji Zanîne

4



Berpirsiyariya  
Mirov

9



## Konferansek Girîng Li Ser Pirsra “Mafê Mirovan, Demokrasî û Federalîzm Di Îranê De” Li Parlemana Ewropayê Birêve Çû

**B** I alîkariya Rêxistina Neteweyên Bê Nûner di Neteweyên Yekbûyî de (UNPO), Kongireya Neteweyên

Îrana Federal û her wiha hejmarek ji endamên Yekîtiya Ewropayê, li Brukselê, konferansek du rojî di rojên yekem û duyem ên meha Nîsana 2009'an de bi beşdariya hejmarek ji endamên Parlemana Ewropa, rêxistinên parêzerên mafê mirovan, çend kesayetiyên siyasî û endamên Kongireya Neteweyên Îrana Federal hate lidarxistin. Roja yekem a konferansê bi axavtina Marîno Bostaxîn, Sekreterê Giştî yê UNPO'yê dest pê kir. Bostaxîn di axavtina de li ser vê yekê tekez kir ku ev konferanse gavek bona cudabûn an parvebûna Îranê nîne, belku derfetek e heta bi anîne rojeva daxwaza Federalîzmê, pênase û her wiha şîrove û dahûrandina warên wê yê cur bi cur, sistemeke wisa di pêşeroja Îranê de bi hê avakirin ku mafê gelan bihê misogerkin û bi awayekî giştî jî, rêz ji mafên mirovan bê girtin û Îran jî yekgirtî û yekparçe bimîne. Di rastî de, li gor gotinên Sekreterê Giştî yê UNPO'yê, ev konferanse gavek e bona gihîştin bi civakeke modern û berpirsîyar di Îranê de. Piştî çend parlamantarên Yekîtiya Ewropayê ji partiyên cur bi cur ên welatên Ewropayê li ser mijara civînê axivîn. Konferansa 2 rojî a Birukselê ji 6 panelan pêk hatibû. Panela yekem ku Sabîn Mayer, Ravêjkarê Ewlekarî û tîkiliyên navneteweyî li Ewropaya Azad û endamê Partiya Keskan serokatiya panela han kir, bisek li ser federalîzmê pêşkêş kir. Di wê panelê de, Dr. Kirîstiyani Bakke, mamosta ji zanîngeha Lîydenê bisek li ser nenavendîkirina desthilatê pêşkêş kir û Dr. Kerîm Ebdîyan ji çalakên Ereben Ehwezê di Kongireya Neteweyên Îrana Federal de û Senem Belûç ji Partiya Neteweya Belûçan her yekê bisek pêşkêşî konferansê kir. Di panela duyem de ku Senator Marko Pîtertoko serokatiya wê dikir, Dr. Hesen Şerîetmedarî, Sekreterê Giştî yê Komarîxwazên Neteweyî, Şaho Husênî, nûnerê PDKÎ li derveyî welat, Yasîn Qubîşî ji çalakên siyasî ên Ehwezê û Ebdîlsetar Doşkî ji avakerên Eniya Yekgirtî ya Belûçistan li Îranê axivîn. Di panelên din de, Nahîd Behmenî, nûnera Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê li Kongireya



Neteweyên Îrana Federal, Nasir Musteşar ji çalakên Ehwezê, Dr. Ziya Sedreşrafî, civaknas û endamê rêveberê rêxistineke Azerbaycanê di KNÎF, Hidayet Sultanzade, endamê Desteya Birêveber ya Tevgera Demokratîk a Azerbaycanê, Nasir Îranpûr, rojnamevan û çalakê mafê mirovan, Dr. Gulmurad Muradî, endamê Desteya Birêveber ya Civata Qelem a Îranê li Sirgûnê, Profesor Elî Elîelîtaî ji zanîngeha Şawa, Dr. Efrasiyab Şikûfe, çalakê sîvil ê Kurdên Xorasanê, xatûna Amal Hîs ji rêxistina Efûya Neveteweyî, Faxte Zemanî, parêzera girtiyên siyasî ên Azerbaycanê, Ebdula Hicab, nûnerê PDKÎ li UNPO'yê, Sureya Dadyar ji Partiya Xelkê Belûçistanê, Nasir Mubarekî çalakê siyasî ê Belûç, Kiyânûş Tevekulî, ji malpera “iranglobal”, Munîr Mengel ji çalakên Belûçistanê Pakistanê, Ebdula Muhtedî, Sekreterê Giştî yê Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê û Kazîm Mecdî ji çalakên Ehwezê axivîn û bi hûrî û berfirehî mijar şîrove û analîz kirin. Di dawîya basên konferansê de li ser vê yekê tekez hate kirin ku hewlên konferansê ji bo gihîştin bi civakeke demokratîk û azad ji rêya ne navendîkirina desthilatê, mafê xwe rêvebirin û federalîzmê li ser bîngeha yekparçeyîya Îranê bû.

Di dawîya konferansê de biryarnamê hate pejirandin ku kurtiya wê bi vî awayî ye:

- Spas û pêzanîna ji endamên Parlemana Yekîtiya Ewropayê û civata navneteweyî bona piştgirîkirin ji kampanya demokrasî di Îranê de.

- Xuyakirina kêfxweşiyê li serketina wê konferansê bi baldan bi vê çendê ku Komara Îslamî a Îranê di hewleke zaf de bû



ji bo hiloşandina wê.

- Tekezîkirin li ser parastina yekparçeyîya axa Îranê û hewildan bona veguhastina aşîyane ber bi demokrasîyê bêy tu xebatekê ji bo cudabûn û perçebûnê.

- Daxwaz ji rêberên Îranê ku li hember peymannameyên navneteweyî, derbarê rêzgirtin ji civata navneteweyî bona mafên çandî, aborî, zimanî û olî bibin.

- Daxwaz ji civata neveteweyî bona piştgirîkirin ji civaka sîvil di Îranê de bi pêkanîna ragihandîneke serbixwe û bêalî a pêkhatî ji zimanên cur bi cur ên neveteweyên Îranê ku pêbend bi Sekolarîzm û mafê mirovan be.

- Daxwaz ji Yekîtiya Ewropayê bona piştgirîkirin ji hemû sazî û komeleyên tîkîldar bi ol û neteweyên cur bi cur.

- Daxwaz ji civata navneteweyî bona piştgirîkirin ji tevgera wekhevîya jin û mêran û parastina pîrensîpên Danezana Cîhanî a Mafê Mirovan.

- Tekezîkirin li ser vê yekê ku demokrasî di Îranê de cihgir nabe, tenê eger pirsra pîrneteweyîbûn û beşdariya wan neteweyan di kar û barê siyasî û biryardana welat de nehê çareser û desteberkin. Hêjayî gotinê ye ku endamên Kongireya Neteweyên Îrana Federal li ser vê baweriyê bûn ku ew konferansa du rojî a li Birûkselê civîna herî girîng a vê kongireyê di heyamê wan 4 salan de ku hatiye avakirin.

Şanda de payebilind a PDKÎ di vê konferansê ji van kesan pêk hatibû:

Şaho Hosên, endamê Komîteya Navendî û nûnerê PDKÎ li derveyî, Dr. Mîro Elyar, endamê Komîteya Navendî û berpîrsê pêwendiyên navneteweyî, Ebdula Hicab, ravêjkarê Komîteya Navendî û nûnerê PDK li UNPO' yê.

## PDKÎ Serkevîna DTP'ê Pîroz Kir

### Rêzdar endamên Rêveberîya Partiya Civaka Demokratîk (DTP)

Tevî rêz û silavan

Serkevîna berçav û mezin a partiya we di hilbijartinên şaredariyên

Kurdîstana Turkiyê de cihê kêfxweşîya me ye. Bêguman serkevîna Kurd li her parçeyekê destkevîta giştî a Kurd e û cihê rêzîlgirtinê ye.

Bi vê hilkevîte ve, em pîrozbahîyê ji we birêzan û hemû xelkê Kurd bi giştî û nemaze Kurdên Kurdistanê Turkiyê dikin.

Bi hêviya serkevîna zêdetir ji bo gelê me.

**Partiya Demokratîk ya  
Kurdîstana Îranê**



**Deftera Siyasî  
06.04.2009  
17.01.1388**

## Aloziyên Nû Di Pêwendiyên Îran û Mîsrê De ...

Selîm Zencîrî

Di çend rojên derbasbûyî de, dezgehên ewlekariya Mîsrê dan zanîn ku girûpek 49 kesî ser bi rêxistina terorîstiya Hizbulaha Lubnanê di Mîsrê de destbiser kirine ku armancên metirsîdar weke terora kesatiyên navdar, afirandina alozî û têkdana rewş û tenahiya Mîsrê û herweha propagande kirin bo hizra şîtiyê şopandine. Herweha dezgehên ewlekariyê dan zanîn ku 4 efsêrên spaha Quds a Îranê jî di nava girtiyan de ne. Li vê derheqê de Mîsrê eşkere kir ku Îran li piştê vî mesleqê ye û dixwaze ji rêya Hizbulahê ve nifûzê bike nava vî welatî û aramî û tenahiya Mîsrê têk bide.

Ji aliyê dinê jî Hizbulahê îtiraf bi şandina çek û teqemeniyên ji Mîsrê ve bo Xezeyê kir û gotinên din jî bi tomet û xwe derbaskirin ji pirsgirêkên navxweyî yê Mîsrê hesaband û raqihand ku dixwaze bi xirabnîşandana rûçikê hizbulahê, bandorek nerênî li hilbijartinên çend mehên din yê Lubnanê de bike.

Her du welatên Îran û Misir serbarê hilkevta jeopolotîkî û jeostratêjîkî ya xwe li deverekê hesas û pir kêşe û aloz ya Rojhilata Navîn de helketine, herweha du cihên girîng weke kanala "Soêz" û "Tengeya Hormizê", li dest de hene û dikarin nexş û rolek çarenivîssaz li hevkeşeyên siyasî yê deverî û cihanî bo minak pîrsa Erebb û Îsraîlê de bilîzin. Lê lînîhîrînek kurt bi ser dîroka wan sê dehsalên pêwendiyên Îran û Mîsrê de rastî û heqîqeta meseleyê bi başî eyan dike. Pêwendiyên wan li sê dehsalên dawiyê de ewraz û nişivên zaf dîtine. Berî şoreşa 1979'an û li serdemê Cemal Ebdulnasir de pêwendiyên Şahê Îranê û Mîsrê ji ber dirûsmên nasyonālîzma erebî û dujminatîya bi Îsraîlê re aloz bûn û wî qazanc û berjewendiya Mîsrê tenê li dujminatîya cîhana Îslamê bi Îsraîlê re didît. Lê piştî bi desthilat gihîştina Enwer Sadat û nizîkatî û pêwendiyên wî bi rojava re carek din her du welat ji hev nêzîk bûn. Lê piştî serketina şoreşa gelên Îranê, Misir jî ji ber aştiya bi Îsraîl re kete ber kerb û xezeba rejîma Komara Îslamî û bi îxanetkar hate nasîn, Paşan piştevanî û keyfxweşîya bi eşkere ya komara Îsamî ji terora **Enwer Sadat**, bi destê **Xalid Îslambolî**, avek sar bi ser pêwendiyên herdu welatan hate rijandin û li piratîk de her du welatan heya niha li biyavên îdeolojîkî û siyasî ve li dijî hev rawestiyane.

Bi taybet wergirtin û binax kirina termê Şahê Îranê li Mîsrê, piştevaniya Mîsrê ji Îraqê li dema şerê bi Îranê re, binav kirina şeqamekê li Teheranê bi navê Xalid Îslambolî, çêkirina filmekê bi navê "îdama Firiûn", çêkirina filmek din li ser Xomênî bi navê "Îmamê xwinê" zêdetir tovê dijberî, hevriki û dujminatîyê çand. Herçiqas ku li qonaxek kurt û li serdemê Xatemi de li sala 1382'an de hevdiîtin li navbera Husnî Mibarek û Xatemi li Jinêvê pêk hat û hêviyek dida germiya pêwendiyên, lê amadenebûna rejîma Îranê bi merca Mîsrê li ser guherîna navê şeqama Xalid Îslambolî dîsan têkiliyên wan vejeriyane ser pêvajoya berê.

Lê ya ku girêdayî bi aloziyên wê dawiyê û desttêwerdanên Îranê bi rêya Hizbulahê, (xêncî xalên jorîn), vedigere ser çend tiştan:

**Yekem:** Îran û Hizbula, Mîsrê bi vî tawanbar dikin ku li şerê 22 rojî yê Îsraîl ji Hizbulahê re, Mîsrê aliyê Îsraîlê girtiye û deriyê xwe li hember Xezeyê daxistiye û dorpêç xistiye ser Xezeyê.

**Duyem:** Midehekê berî niha Husên Şêxulîslamî, cîgirê Wezîrê Karê Derve yê Îranê gef ji Mîsrê xwarin ku ger bê endamên Mucahidîn Xelq a Îranê weke penaber yan li xaka xwe de cih bide, dê dijkiyara Îranê bibîne.

**Sêyem:** Îran dixwaze sinorên Îsraîlê nearam û wî welatî bi kêşeyên navxweyî mijûl bike û, derfeta êrişa Îsraîlê bo ser xwe nehêle.

**Çarem:** Cehd û xebata Îranê bo çavtirsandin û alozîkirina pêwendiyên welatên Erebbî (bo minak hesabandina Behrîne weke parêzgeha 14'mîn a Îranê û xwedî derketin ji her sê giravên Tunda biçûk û mezin û Ebû Mûsa). Bi giştî em dikarin bibêjin ku liv û riftarên Komara Îslamî ya Îranê di çarçûveya gefxweşîyê jî cîranan, piştevanî û perwerdekirina terorîstan, hevkarîya tundrewan, desttêwerdan li karobarên welatan, pêşgîrî jî prosesa aştiya Filistin û Îsraîlê, dijatiya rojava, xwe bi nûnerê xwedê û cîhana Îslamî zanîn, xwe wek superhêzek herêmî nîşandana û ... dizivire.

Lewra ew kiriyara Îranê carek din da xuyakirin ku li bejna xirik hemû tiştêk diweşe. Herweha vî peyamê ducarî dike ku rejîma Teheranê çiqas qef û metirsîdar e bo ser aramî û aştiya dever û cihanê.

Helbet di demekê de ku bi eşkere li xebat û tekoşinê de ye ku çeka etomî jî bidest bixe û wê hevterîb ligel siyasatên dijî mirovî, biyûm û dujminkarane yê xwe li dijî welatên cîhan û deverê bikar bînin.

Lewra carek din hewcehî bi pêdeçûna Rojava û welatên Erebbî bi liv û riftarên bi Îranê re û hevdengî û yekêtiyek qahîmtir li dijî vî rejîma serberdayî dike.

Mafê Mirovan



Nivîsin: Peter R. Baehr  
Wergeran: Mecîd Heqî

### Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Hîrarsîya mafên mirovan

**H**îrarsîya mirovan u şeweyên hevbeş ên ku mafê mirovan li hîrarsîyekê rêz bike tune ye. Heta li Rêxistina Neteweyên Yekgirtî hinek mafên mirovan ji hinek ên din giringtir tene zanîn. Serbarê wê yekê

hinek cudahî di navbera wan de hene. Ji ber ku hinek maf hene li gor benda çaremîyan ya Carnameya Mafên Sivîl û Siyasî nabe heta di dema hukûmeta leşkerî û na-asayî de lê bîn kêmkirin. Ew mafane mafê parêzgarî li mafê jînê, qedexekirina îşkencê, qedexekirina koledarî û serbestîya hizr û serbestîya wijdan û ayînan. Lê tu mafên civakî û abûrî di nav wan da nînin. Mafên din ên mirovan navek din weke mafên "bê kêmanî" hatin binavkirin. Di wê derbarê de hewce bi bîranîne ye ku di sala 1984'an de, civîneke pisporên navneteweyî li Syrakusa Îtalya hat darxistin ji bo ku aliyê kêmanî yê mafên mirovan û sînûr û kêmkirina wan diyarî bikin. Armanca wê yekê ew bû ku şertên kêmkirin û sînûrdarkirina mafên mirovan bi awayekî rohn bîn şirovekirin. Hetanî niha jî ew pêşniyare li tu peymanên yasayî yê navnetewî cih negirtiye. Tiştêk din ku mafên mirovan rêz dike, cudahiya di navbera mafên bingehîn û yê din de ye.

Mafên bingehîn ew maf in ên ku pêwendî bi hebûna mirov hene û ji ber wê jî diviya bi awayekî reha (mutleq) bê parastin. Nimûna wan mafên bingehîn mafê jiyane û parastina hurmeta takekes e ku mafê qedexebûna koledariyê, reiyetî û îşkencê, girtina bê heger, ferq û cudahî û perawêzkirin û kiryarên din yê ku maf û hurmeta mirovaniyê dipelixînin.

Mafê serbestîya ayîn û mafê serbestîya xwe îfadekirinê herwisa wek mafê bingehîn hatine naskirin. Hinek nivîskar mafê bidestveanîna xwarin, cil û berg, xanî û derman bi mafê bingehîn didin naskirin.

Cudahiya navber mafên bingehîn û mafên din belkî di dariştina siyasetê de gellek giring bin. Dewletek belkî hinek hişyarantir reftarê bike, ger bi hegera pêşeskirina mafên bingehîn hatibe rexnekirin. Rewşek wisa daxwaza rohnkirin û şirovekirina mafên bingehîn dike. Ger gellek ji mafan wek mafên bingehîn bîn naskirin, wê demê dê ew mafane giringiya xwe ji dest bidin. Dibêjine wê yekê enflasyon an tengejeya hevokan.

#### Kardaneweya asoyî û estûnî

Hetanî wê gavê me basa mafên mirovan bi awayê stûnî yan serjêr (vertical) kiriye, bi wê wateyê ku mafê takekes an girûpan ji aliyê dewletê ve bê parastin. Herwisa watayeka asoyî, rast (horizontal) jî di mafan de heye û ew jî hezkirin bi pêwendiyên di navbera *şarovendan* de heye.

Di wê rewşê de erkê dewletê parastina şarovendan li hember destdirêji û zulma şarovendan bi ser mafê hevdu ye. Li serpêhatiyên Wezîrê Berê yê Holandê berî ku basa mafê jîn, mafê serbestîya takekes ku dewletê erkar dike li parastina mirovan li hember xelkê wek xwe û li hember zul û zexta ku ji aliyê mirovan ve bi mirov tê kirin, hatiye: "Gellek bi kurtî sînûrê serbestîya mirov li dema ku maf û serbestîya kesek din dipelixîne, tê sînûrdarkirin."

Di siyasatên derve de mafên stûnî li mafên asoyî giringtir in, ji bilî wê dama ku dewletek bi agahî mafê hin takekesan neparastiye an jî meydan daye hinek kesan ji bo bînpêkirina mafên hin kesên din li hundir û derveyî welat. Ewana ji aliyê kesên ku bi "desteyên mirinê" tîn naskirin, li dijî rikeberên ramyarî bin, rênîşaniya rasterast a dewletekê (karkirina stûnî) an bi razîbûna dizî a dewletê (karkirina asoyî) tîn çibçikirin.

## RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



## Tirsa ji zanînê

**T**eknolojîya Agayî û Pêwendiyên TAP (ICT) bi lez cîhanê diguhere û sînûrên di navbera mirovan de her

ku diçe kêmîr dike. Ev teknoloji li warên zanist û aborî ve bigre heya meydana siyasî û rojnamevaniyê, weke emrazek xurt ya pêwendî û agahiyan ketiye xizmeta mirovayetiye û bi lez jiyana mirovan diguhere. Lê renga alîkariya herî xurt ya ku ev teknoloji ji mirovayetiye re dike, ev be ku kontrol an monopola agahî û pêwendiyên tenê di destê desthilatdaran de nehîştîye. Lewma di demokrasîyan de, TAP/ICT weke emrazek ji bo xurtkirina bingeha demokrasîyê û mafê endamên civakê tê bikaranîn û di sistemên dîktator de heman teknoloji dibe dijminê sereke yê sistemê. Kultûra bikaranîna înternetê ji xwe kultûrek genc e. Îran di wî warî de hê sawa ye. Lê digel wê sawatiyê jî rewşenbîr, rojnamevan û çalakên medenî li Îranê, di demek kin de karîne înternet û teknolojiya pêwendiyên Înternetê bikin yek ji emrazên here xurt ji bo şiyarkirina civakê. Lewma rêjîma desthilatdar çalakiyên înternet û rojnameyên elektrîkî an bi zimanê ICT, nivîsa weblog an weke metirsiya herî mezin ya li ser desthilata xwe temaşê dike.

Digel astengiyên bingehîn, Îranê sala 2004'an, anî 11 sal piştî bikaranîna rojnamevaniya elektrîkî, bi neçarî rê da ev teknoloji bikeve xizmeta rojnamevaniyê. Di destpêkê de karbidestên ev teknoloji ji bo armancên xwe yê siyasî û îdeolojîk bikar dianîn. Lê rojnamevan û çalakên medenî li Îranê, pîr zû ev teknoloji ji dest desthilatdaran derxistin û kirin emrazek xurt ji bo pêşvebirina dîtin û bîra derveyî îdeolojîya fermî ya desthilatê. Ew kar bi awayek berfireh bandor xiste ser jiyana civakê û şeweyek nû ya têkoşîna civakî ji bo guhertina rewşa siyasî li Îranê bi pêş xist. Bi awayekê ku li ciyê kanalên ragehandina fermî û dezgehên propagandaya dewletî, înternet û medya elektrîkî weke sistema ragehandin û agadariyê ya alternatîv her hat û pitir di nav civakê de ciyê xwe kir.

Bi wê pêvajoyê re, Komara Îslamî monopola ragehandinê di hundirî welat de ji dest da û tîrsa hindê lê peyda bû ku neke êdî kontrola agahî û zaniyariyên dikevin nav civakê ji dest derkeve. Di rewşek weha de dê zehmet be ku xelk fêr û xapên karbidestên bipejirînin û ji rewşa ku tê de nerazî bin. Ji ber wê sedemê Sipaha Pasdaran ku ji destpêka damezirandina xwe

ve weke organa here serkutker û dijî azadiyê li Îranê kar kiriye, organek taybetî ya kontrola înternetê û dijberiya bi çalakiyên li rîya înternetê ve ava kir. Bi damezirandina wê dezgeha kontrolê, Sipah bi awayek sistematîk kete dijberiya rojnamevan û çalakên medenî yê ku li derveyî xwesteka rêjîmê dixwestin înternetê weke kanala zaniyarî û agahiyan bikar bînin.

Piştî xurtbûna çalakiyên bi rîya înternetê ve, rêjîm bi yekcarî xwe di tehlîkeya şiyarbûna civakê de didît, lewma sala 2004'an, yasayek taybet li dijî "tawan"ên înternetê da pesendkirin. Lê bi wê jî nesekinî û di heyva Sermaweza sala 2008 (1387) de, dadgehek jî bi heman mebestê ava kir. Ji wê demê ve êdî sînûrê yasayî ji bikaranîna înternetê re danî û bikaranîna înternetê ya li derveyî îdeal û xwestekên xwe weke tawan da hesibandin û bi suç da zanîn.

Di wan salên dawîn de heya niha bi dehan rojnamevan û çalakên medenî ji ber karê xwe hatine girtin û ceza bi ser wan de hatiye birrîn. Sala 2008ê, her weha di Parelmana Îranê de biryar hate dan ku hin çalakiyên li rîya înternetê ve, mîna belavkirina agahiyên derew, belavkirina wêneyên mustehcen û belavkirina fîsed û fehsa bi rîya înternetê ve bi îdamê bêne cezakirin. Ji ber ku tevlihevkirina sînûrê siyasî û xebata dijî exlaqî rê dide ku rêjîm hêsatir bikare dijberên xwe ji nav rake, her li destpêka amadekirina yasaya nû, Komara Îslamî çarçoveyek weke hev ji wan karan re danî.

Ji wê demê ve têgeha "belavkirina agahiyên derew" weke emrazek siyasî li dijî çalakên medenî û xebatkarên mafê mirovan tê bikaranîn û hemû çalakên ku bi rîya weblogên xwe ve mijara mafê mirovan tînin rojevê weke "tevder", derewîn û dijberê sistemê tînin binavkirin. Girtin û kuştina çalakên medenî yê bi rîya nivîsîna weblogan erka xwe ya rewşenbîrî bi cî dianîn, ji wê demê ve bûye beşek ji siyaseta Komara Îslamî. Kuştina weblognîvîs, Umîd Reza Mîr Sefayî, di meha Adara îsal de li girtîgeha Êvîna a Tehranê wek mînaka herî dawî ya cinayetên Komara Îslamî tê zanîn. Digel ku tu guman nîne ku kesên cinayetkar, înternetê ji bo armancên xwe yê derveyî eqlaqê mirovatiyê bi kar tînin, lê tu guman di hindê de jî nîne ku armanca wan kesan tu gav dijberiya sîyasî bi rêjîmên dîktator re nîne. Ji ber ku ew di dîktatoriyan de pîr rahet dijîn û bi pêş

dikevin. Li hemû demokrasîyên îro yê cîhanê, bandên krîmînel înternetê ji bo mebestên pîs bi kar tînin û li her derê cîhanê ew şeweya bikaranîna înternetê weke tawan tê nasirin û karê wan kesan dikeve xaneya tawanên civakî. Lê Komara Îslamî wê çarçoveya tawanê tenê ji bo armancên siyasî bi kar tîne. Li gor navenda dijberî bi sûcên înternetê ya Sipaha Pasdaran, di wan rojên dawîn de komek "dijî şoreş" ku bi rîya webloga xwe û bi belavkirina nivîsên "mustehcen" û dijî şoreşê ji bo hilweşandina rêjîmê kar dikir, hatiye girtin. Sipaha Pasdaran ew operasyon weke serkevtînek mezin bi nav kir û da xuyakirin ku dê çalakiyên li dijî xebata înternetê hê xurt bike. Sipahê neda xuyakirin ka bi çi rengî wê koma "dijî şoreş" siyasî û fîsed tevlihev kirine û wêneyên rût bi gotar û nivîsên siyasî re belav kirine heya civakê li dijî rêjîmê rakin ser piyan.

Lê rêjîm bi xwe jî dizane ku tu kes bi wan gotinan nayê xapandin. Mewdaya di navbera cinayetên exlaqî û siyaseta li dijî rêjîma Komara Îslamî weke hizra desthilatdar û hizra alternatîv ku demokrasî û wekhevîyê dixwaze ji hev dûr in. Ew kesên ku di wan salên dawîn de bi rîya înternet û nivîsa weblogan mijarên weke wekhevî, demokrasî û mafê mirovan bi pêşve dibin, ji rêjîma Komara Îslamî bêhtir li dijî grûpên berjewendîperest yê canî ne ku ew jî mîna Komara Îslamî tenê bi çavê ticaret û emraz temaşeyî mirovan dikin. Ji ber ku bingeha fikrî û exlaqî ya wan û ya tundajoyên ku îro desthilata siyasî li Îranê birêve dibin, yek e. Her du mirovan weke emraz temaşê dikin. Her du amade ne bikujin ji bo pêşiya wekhevîyê bigrin. Her du ji vekirin û eşkerebûnê ditirsin. Her du ji şiyariya civakê ditirsin. Her du bi tenê di hizra berjewendiyên xwe de ne û her du li dijî civakê ne ku di wê de hemû mirov xwediyê derfetên wek hev bin. Komara Îslamî ji ber wê hindê xirab bikaranîna înternetê, bi çalakiyên siyasî û rewşenbîrî ve girê dide heya bi dîtin xwe dijberên xwe pê bişkêne. Lê îro êdî her kes bi fêd û xapên Komara Îslamî hesiyaye. Kesên weblognîvîs û ewên Teknolojîya Agahî û Pêwendiyên ji bo pêşvebirina demokrasîyê bi kar tînin, ji tundûtûjî û pilana hilweşandinê bi dûr in. Mebesta wan bi tenê ew e ku agahî û zaniyariyên rast di nav civakê de belav bikin. Lê rêjîma Komara Îslamî ji rastiye û ji zanînê ditirse. Ji ber ku li ciyê ku zanist û rastî hebin, dîktatorî û derewê re cî namîne.

Mêrxasî û berxwedana sê roje ya şerê Ceter

## Gelî hevalan !Eger hûn Çûn Min cî Nehêlin

Beşa 6



Silêman Keleşî

Xêncî wî ciyê ku di beşa 5'an de hatibû baskirin, şer û berxwedan di gellek ciyên din yê gundê Ceter û derdora

wê de bi tundî dom dikir. Lê leşkerên dagirker hemû hewla xwe didan ku wê qada şer ku du caran tê de rastî têkçûnê hatibûn, têk bişkînin û bikarin bên nava gund û rêya derçûna Kadr û Pêşmergan bi tevahî bigre. Ji ber vê hindê şerê herî giran kete wê meydanê û heta êvarê jî berdeham bû. Lê berxwedan û fidakariya hêzên Pêşmerge nehêlan dijmin bigihîje wan armanç û xewnên xwe di wê qada şer de. Her wisa armanca duyan ya dijmin ewa bû ku wan girên pişt gund bigrin destê xwe û piştê bi keyfa xwe di nava gund de hemû Pêşmergan bi kom bikujin. Lê ew çend kesên leheng û egid ku ji wan hûre girikên zal bi ser gund çepera mêraniyê girtibûn (tenê 5 - 6 Pêşmerge bûn), bi dana şehîd û birîndarekê karî heta xilasbûna şer li hember hêz û topbarana dijmin rawestî û hevalên xwe ên di nava gund de li dorpêçkirina tevahî parastin.

Dikarim bêjim berxwedana wan hevalan bandoreke gellek zaf li ser pêvajoya şer hebû. Eger fidakarî, berxwedan û mêrxasiya wan neba, qedera şer dikarî bi awayekî din bi dawî be.

Her wisa şer di taxa gund ya ku dikeve aliyê gundê Îngîcê, dom dikir. Lê dijmin ji wî rexî re êrîşên qurs bo hatina nava gund nedikirin û belku her dixwastin zêdetir hêzên me mijûl bikin. Şer ji hemû aliyên ve dom dike û Kadro û Pêşmerge berxwe didin û her kes di ciyê xwe de mêrxasiyan diafirîne. Her di wê demê de ku şer ji hemû aliyên ve dom dikir, dijmin bo cara sêyan jî bi êrîşeke qurs û giran xwest şans û bextê xwe bona girtina wê beşa gund ku dikeve aliyê gundê Mîrava û Sakan, biceribîne.

Pêşmergeyên wê qadê du caran bi mêrxasiyê mezîna êrîşên qurs û giran ên dijmin têk şikandibûn û bi dehan heta sedan cenazeyên Pasdar û kirêgirtiyên dijmin li ser berfa sar û tezî ya derdora gundê Ceterê ketibûn. Lê kuştina merivan ji bo karbidestên Komara Îslamî girîng nebû. Ya herî girîng ji wan re ewa bû ku



bêne nava gund û bi afirandina komkujiyê bikarin kerb û kîna xwe ku govannameya şikestên di şerên wan sê rojan de bû, vala bikin.

Pêşmergeyên ku herdem parêzvanên av û axa Kurdistanê û şerê û kerameta gelê xwe bûne, ma de îcaze didin ku dijmin wisa bi hêsanî bête nava gund!? Wextê Pêşmergeyan didîtin ku bi topbarana dijmin di nava gund de, ter û hişk bi hev re tê şewitandin, dema dengê qîrîn û hawara zarokên sivîl û bê sitar dibihîstin, wextê dengê gazî û hawara dayik û baban têkêfî dengê ofên û nalenala birîndaran dibihîstin, ji Xwedê dixwastin ku hêzên dijmin ji wan nêzîk bin ku bikarin bi çeng û didana tola xelkê bê berevan û sivîl û wan dimênên ku dil û hinavê her mirovekê dihejand, hildin.

Di cara sêyem jî dijmin hêzeke zaf bona girtina gund anî meydana şer. Lê ka ew hêzane dikarin xwe li hember hêz û kerbê Pêşmergeyên dilşewat rabigrin!? ew Pêşmergeyên ku çend demjimêrek e di bin topbarana dijmin de xwe mat kirine û hevalên wan li ber çavên wan şehîd û birîndar dibin, ji Xwedê dixwastin hêzên dijmin bikevin nav destê wan.

Dema ku hêzên zaf û tazenes ên dijmin, lê bê moral û ruhiye û tirsanok ku bi ser cenazê sedan Pasdar û Caş û Besicîyan re derbaz dibûn û bi qedem û pêngavên şikestî xwe gihîjandin çeperên mêrxasên demokrat.

Dîsan qehremanên PDKÎ ji kozikên xwe hatne derê û di şerekî mêrxasane û bê hevta de karî di demê kêma de ew hêza wan jî ji nav bibin û cara sê yê jî leşkerên dijmin gellek ji du carên pêşîn xirabtir rastî têkçûnê hatin û xincî kuştinê tiştêkî din nesibê wan nebû. Piştî wê têkşikana û navçûna hêzên wan îdî dijmin dest ji hêrişê jî bo wê qadê berda. Ji ber ku hind cenazên wan wî aliyê gund ketibûn, her hêzeke wan heta bi ser wan hemû cenazan re derbaz dibû û dihate nêzîk kozikên Pêşmergan, bi rastî dil û hinavê wan diqetiyên û bi xwe nivîrhî dibûn û nedikarin digel Pêşmergan şer bikin, heta çend kesên wan bi saxî xwe di nava cenazan de veşartibûn ku heval piştê pê hesiyên û der anîn û girtin.

Hewce ye bête gotin ku di wî şerê dest bi pêşîr de bûyereke gellek balkêş çêbû. Ew jî ewa bû ku em û hêzên dijmin hinde ji hev du nêzîk bûn ku yek du kesên wan daxwza teslîmbûnê li me dikirin û heval jî demekê pêve bûn, nekarî wan du kesan ji sengerê rakin. Piştî demekê Hacî Cindî got: "hûn teqê lê bikin û ezê herme nêzîktir".

Her çend xetereke gellek ji bo Hacî hebû, lê di rojên wisa de xeter mana xwe nine. Hewce ye meriv lêzanî û îbtikarê bi kar bîne bona serkevtin û xilaskirina canê hevalên xwe. Di roj û demên wiha de tenê û tenê fidakarî ye ku dikare meriv bi ser dijmin de zal bike. Demekê me dît ku Kek

Hacî tevî Pasdarekê dest bi pêşîr bûye û kêşekêşa wan e. Baş bû ku Hacî karî wî jî ser rê rake.

Gelî xwendevanên hêja! renga ji bo hindek ji we ew şera wek dastanekî çêkirî bête berçav. Bi xasma ji bo nîfşa nû û yê ku ji nêzîk ve şahidê wan qehremaniyên ku di Kurdistanê de hatine kirin, nebîbin. Ez jî heq didim wan kesan ku bi wî awayî bifikirin. Ji ber ku bo min jî ku di nava wî şerî de bûme, piştî derbasbûna 24 salan, gellek ecêb tê berçav û ji xwe dipirsim gelo ew yêka çawan çêbû!? Lê eger em bûyera şer bi awayekî deqîqî bînin ber çavên xwe ku çawa qewimî ye ku tede zêdetirî 300 kes ji hêzên dijmin di gundê Ceterê de hatin kuştin, hingê mirov dikare her qewimandinekê bi rihetî qebûl bike. Ew şera wek hemaseyêkê dîrokî ku bi şerê sê roje li herêma "Şimala" Kurdistanê û gundê Ceterê hatiye binavkirin, her tim dê di dîroka gelê Kurd de bi giştî û nemaze PDKÎ dê bimîne.

Di wan sê roj û sê şevan de zêdetirî 400 kes ji hêzên dijmin hatin kuştin ku di dema xwe de ji Radyo Dengê Kurdistanê Îranê hate xwandin. Gorî zanyariyên ne fermî, hejmara kuştiyên dijmin ji 400 kesî gellek zêdetir bû ku tenê pitir ji 300 kesên wan di gundê Ceterê de hatibûn kuştin. Di wî şerî de her wisa 13 Pêşmergeyên qehreman şehîd û 38 kes jî birîndar bûn. Hewceye bête gotin ku wê demê hevalên berpirs navê 14 kesan bi şehîd dabûne Radyo Dengê Kurdistanê Îranê û her wisa navê 14 kesan jî wek Şehîd hat xwandin. Lêbelê yek ji wan bi navê Rehîm Mehîmûdî Pêşmerge hêza Şehîd Aware du rojan piştî şer bi alkariya xelkê xebatkar yê deverê bi saxî hat û gihîşte hevalên Pêşmerge.

Ew roje di jiyana min û gellek hevalên wekî min de qet nahê jibîrkirin.

Şer ji hemû aliyên ve her dom dikir. Pêşmergeyan bi gorîkirina canê xwe gund ji hêzên zordariyê diparastin û nedihêlan ew bikevin nava gund.

Wek mirovên olperest ku gellek caran dibêjin, ku roj roja qiyametê bû! Ez jî dibêjim roj roja man û nemanê bû. Dîroka Kela DimDim dihate bîra mirov ku çawa ji aliyê leşkerên Şah Ebasê Sefewî ve hatibû dorpêçkirin û rêya derbazbûn û pêşveçûn yan jî paşveçûnê nemabû. Tenê û tenê rêya xilasbûnê, berxwedan û berxwedan bû. Diviya ji bo man û serkevtina xwe, me ew bikuştana ku em bi xwe neyên kuştin.

Belê roj kurtika zivistanê li me dirêj û dirêjtir bûye û qet nabe êvar. Wextê şerê bi çekên sivik tevî dijmin dest pê dike, ji bo me wek dawetê ye û em mijûlê şer dibin. Lê her çî hêzên dijmin tene meydana şer û digel Pêşmergeyan rûbirû dibin, nikarin demêkê dirêj xwe ber kerb û kîna wan rabigrin û gellek zû ji holê radibin, û dîsan topbaran dest pê dibe û roj li me dirêj dibe.

Eger şev bo hemû kesekê nexwaş û tarî

be, berevajî wê, şeva tarî bo Pêşmergeyan hertim ciyê hêvî û mîrxasî û zalbûna wan bi ser dijmin de bûye.

Ji ber ku Pêşmergeyan dikarî gellek baştir bilivin û karê xwe bikin û îdfî topxane û çekên qurs bo wan gellek bi bandor nebûn.

Belê leşkerên zaf ên dijmin bi wan îmkantên xwe heta êvarê çendîn caran êrîş anîn ser parêzvanên Kurdistanê. Lê nekarî bigihîjin armancên xwe û her carê jî derbên giran li wan diketin. Her wisa dem bi dem zirar û zîyanên me jî zêde dibûn.

Wextê ku dijmin dît ku Pêşmerge wek parêzvanên Kurdistanê şerê man û nemanê dikin û bi çî qîmetekê derfetê nadin ku gund bi tevahî dorpêç bikin û her tîm û desteyek wan diçe û sax navegere, mecbûr man dest li wî bereyî berdin û bo aliyê Îngîce û Rîkavayê bimeşin.

Leşkerên dijmin ji hemû aliyan ve tûşî şikest û kuştîyên yêkcar zaf bûye, lê dest ji êrîşên xwe bernade. Xuya bû ku dijminê sondxwarî ye ku hemû şervanên azadiyê bi kuştî yan bi saxî di gundê Ceterê de bigre.

Her çawa hate gotin, ewkurte rojan zivistanê li me dirêj bibû û mirov digot roj îro ingirî ye û naçe ava nebe.

Wê rojê esman saf û taweke xweş derketibû. Lê tawa xweş û geş ber dûkela şer û topbaranê, rengê xwe ê xwezayî ji dest dabû. Hinda gund û çeperên Pêşmergeyan bi dûkela top û katyoşabaranan reş bibû û bi bêna barûtê hatibû dagirtin. Rojê hêdî hêdî dixwest ava bi be û xatira xwe ji Şehîdên roja 16.10.1363'an dikir.

Sir û sîbera êvarê bi ser dehan birîndarên bê derman û duktor ku bi dora xwe dipêçin û hawar û nalînan dikin, tê. Dîmenek pîr xemgîn û dilşewat bû. Lê Şehîd bo herdem bêdeng razane û dilê wan yê tijî xwezî û hêvîdar bi azadiyê ji lédanê ketiye.

Birîndar ji ber girêndana birînen wan û çûna xwîna zaf, rengê wan sipî bibû. Ewan bi hêviya derman û derbazbûnê destên xwe ji bo aliyê hevalan dirêj dikirin û hindek caran jî dipirsîn û digotin: "Encama şer çî lê hat û şer li kîderê ye" yan jî digotin: "Kî Şehîd bûye."

Cil û bergê Pêşmergeyan di çeperên ser berfê de ter bibûn û digel hatina sira êvarê û roj avabûnê, di ber wan de diqerisîn û wek kuçan lê dihatin û hişk û req dibûn.

Belê şer ji hemû aliyan ve didome û gundê Ceterê her wisa di bin topbarana dijmin de ye û ter û hişk bi hev re dişewite. Rastî kes nizane ka çend Şehîd û birîndarên me hene.

Her kes û tîmek tenê haydarê derdora xwe hebû û nedizanî ka rewşa tîm û komên din ên hevalan çawan e. Ji ber vê hindê peywendiya Fermanderên leşkerî bi awayekî giştî digel tîm û desteyan gellek zehmet û dijwar bibû. Lê her girûp û desteyekê di ciyê xwe de dizanî ku çawa berxwe bidin.

Gelî xwendevanên hêja! wisa başe ku em digel hev di kêleka gund û ji rêya çeperên Pêşmergeyan qehreman herin nava kûçe û kolanên gund ka çî derbaz dibe. Rastî wê rojê gellek dîmenên tirsnak û balkêş dihatin dîtîn. Her wek hûn dizanin, xelkê gundan di zivistanê de ji ber xwedîkirina pez û heywanên xwe, ji gund dernakevin.

Lewra hemû xelkê gund – pîr, genc, jin û zarok- hemû bê deretan û bê star digeriyan ka çawa bikarin starekê bo xwe û zarokên xwe peyda bikin. Lê ka star kîderê dest dikeve!? Ma kê hizra hindê kiriye ku rojekê gundê wan dê bi vî awayî bikeve ber agirê top û katyoşayên dijminê bêrehm û dirinde.

Eger çavê mirov li wan dayîk û babên perîşan diket ku zarokên piçûk li dergoşa xwe girtine, lê nizane bo kuderê herin ku xwe û zarokan biparêzin, tenê tişt a destê wan dihat ew bû ku gazî û hawara Xwedê û Pêxemberan bikin ku wan biparêzin, wextê ku dengê hirmîn û girmîna topan dihat û bi dengê qîjeqîja zarokên sawa re tîkel dibû, wijdana her mirovekî xwedî wijdan dihejîya. Xwezî wê rojê derfeta vê hindê heba ku mirov filmek yan jî çend wêneyek ji wan dîmenan hilbigire ku îro bidaniya ber çavên xwendevanan ku bê nivîsîn hovîtiya dijmin nişan bidaba. Dema ku dayîka ku tevî du sê zarokên xwe di nava kûçe û kolan de digeriya heta ciyeke bê şehîd û birîndar peyda bike ku zarokên wê dîrî dîtina xwîn û birînan bin, wextê ew li qerax û kêleka cenazê şehîd û birîndaran re derbaz dibûn û birîndaran daxwaza alîkariyê ji wan dikir, lê çî ji destê wan nedihat, xwezî û sed xwezî min bizaniya ku wextê ew dayîk û zarokên wê wisa li ber wan şehîd û birîndaran re derbaz dibûn û her çend pêngavan carekê pişt serê xwe ve mêzeyê wan dikirin ka çî tiştê li bîr û hizrê wan re derbaz dibû. Rastî ez nizanim çawa wan hemû dîmenane bi rêya nivîsînê re bêxim ber çavên we..

Ewa rastî karê min nine. Ewa karê wan kesa ye ku nivîskar in û dikarin bi heq li gora qewimînê bi edebiyateke dewlemend ku hêja û layiqê wê bûyerê bû, binivîsin. Lê ez bi erkê xwe dizanim ku nehêlim heta ew ciyê ku ji destê min tê, ew bûyera wînda be.

Dûmahîk heye ...

Şiroveya  
Peyvên Siyasî

Berhevkar:  
Omîd Esxeran  
omid\_anbi@yahoo.com



## Îrastîyanîzm

Îrastîyanîzm, navê felsefeya Can Sîldon(John Seldon), filesofê Îngilîzî ye

ku di dawîya sedsala 16'an û destpêka sedsala 17'an de bona dijberîkirin li hember bihêzbûna alfigîrên "Jizoyîte"an, li Ewropa çê bû.

Ev felsefeya siyasî bi tevahî piştevanî ji desthilata dunyayî dikir û ragihand ku oldar û olxwaz ji gotinên "Mesîh" dûr ketine û kilîsa xwe bi giştî tîkelî kar û barên dunyayê kiriye.

Çawa Mesîh xwe tîkelî kar û barên siyasî û dunyayî nedikir, divêt ku Papa û Kardînalên wî jî xwe tîkelî kar û barên siyasî û cîhanî nekin. Di rastî de em dikarin bibêjin ku Can Sîldon, bîngeha felsefeya xwe li ser ew axavtina Mesîh ava kir ya ku dibêje: "Ew tiştê ku pêwendî bi Qeyser heye, divêt ku ji bo wî bi cî bihêlin, em paşayetiya axiretê hildibijêrin".

Can Sîldon li ser wê baweriyê bû ku qanûnên ve serdemê yên welatên Ewropayî, rehendekê yezdanî nînin, belku tenê bi sedema rewşa siyasî a civakê kîlasîk ava bûne.

Ji ber vê yekê jî nabe bandora desthilatdarên kilîsayê li ser hêz û desthilata giştî de hebe.

Divêt desthilatdarên kilîsayê bi vê pileya nav civakê ku xelkê sivil didin wan, razî bin. Hinek çavkanî "Marsêl Dopado"yê Îtaliyayî bi avakerê vê teoriya siyasî dihesibînin ku di sedsala 13'an de dijiya, lê çavkaniyên Almaniyayî vê yekê bi rast nizanin, ji ber ku bi nêrîna wan "Marsêl Dopado" Teolojîst bûye û zehmet e ku kesek li dijî bîr û bawerîyên xwe teoriyekê ava bike.

Çavkanî: (Fehengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî

(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary"

Daryûş Aşorî

## Hevpeyvîn digel Senar Hatemî, çalakê siyasî û sivil yê Kurd

### “KURDAN HERDEM HEWÎL DAYE KU PÎRSA XWE YA NETEWÊYÎ BÎ RÊYA GOTÛBÊJ Û AŞTIYANE ÇARESER BIKÎN”

#### Hevpeyvîn: Agirî

**J**i kerema xwe re, xwe bide nasîn...

Ez Senar Hatemî me. Sala 1978'an li gundê Nêrgi ser bi devera Mirgawer a bajarê Urmîyê li Rojhilatê Kurdistanê jî dayîk bûme. Ji ber xebat û çalakiyên siyasî ez neçar mam Kurdistanê bicî bihêlim û niha li welatê Swîsê dijîm.

**- Roj bo rojê xebata sivil û aştîxwazane di Rojhilatê Kurdistanê de xurt dibe, bi raya we sedem çî ne? Hûn qazanc û feydeyên xebata sivil û aştîxwazane li gor rewşa niha ya Kurdistanê Îranê çawa dibînin?**

Ger em mêzeyî dîroka kurdan bikin, her tim rêberên kurd hewil dane ku bi rêya gotûbêj û aştîyane pîrsa kurd çareser bikin. Ji ber ku tundûtûjiyê xêncî zirarên mezin yên madî, zirarên mezin yên mirovî jî heye. Dijminên Kurdan bi enqest her gav şer bi ser Kurdan sepandine, ji ber ku xwestine ku jiyana civaka kurdan bi vê hêcetê paşde bihêlin. Gelê kurd bo gihîştin bi armancên xwe her tim hazir e rêya aştîxwaziyê bigre pêşya xwe û çendî rêberên mezin ên me weke Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkandî her di wê rêyê de canê xwe fîda kirine û hatine şehîdkirin. Gelê kurd qet şerxwaz nebûye û herdem şer ji aliyê dijminan ve bi ser gelê me de hatiye sepandin. Ewan bi rêya şerê xwe re gellek zirarên mezin li kurdan dane. Ne tenê zirarên madî û mirovî, wan jî rêya bikaranîna çekên kîmyayî û qedexekirî, xwezaya (sirûşt) Kurdistanê jî tûştî giriftên mezin kirine û sistema êkolojiya Kurdistanê jî hatiye guhartin.

Ji aliyê din ve, her qonaxê xebatê metod û rêyên xwe hene. Piştî dawîhatina şerê sar û destpêkirina qonaxa globalîzasyonê, ku diniya wek gundek piçûk jê hatiye û dewletên dagirker jî di warê leşkerî de gellek ji caran xurttir bûne, bi çekên sivik û şerê partîzanî em nikarin bi armancên xwe bigîjin. Di serdema niha de ku serdema li hev têgihîştinê ye û her bûyereke ku li welatek yan navçeyêke cihanê biqewime, bandorên xwe li ser siyaseta dewletan didanê. Yanî ez dixwazim bêjim ku heke pîrsa kurdan li ew welatên ku Kurdistan di navbera wan de hatiye parvekirin, eger caran pîrsgirêka navxweyî dihat hesabandin, îro rojê pîrsa han bînpêkirina mafê mirovan û dijberîkirin tevî demokrasiyê tê hesabandin. Ji bo pêşxistina doz kurd xebata medenî û aştîyane jî gellek bi bandor dibe. Em dikarin ji wê rêyê ve, bi

awayekî sivil û aştîxwazane yekîtiyê di nava gel de çê bikin û civaka medenî di welatê me de bihêz be û her wiha bîr û raya dewletên derve bo aliyê pîrsa kurdan bîkşînin ku alîkariyê bikin çareseriyek dadperwerane bo wê pîrsê bête kirin. Dewletên ku Kurdistan jî dagir kirine di rewşa îro ya cihanê de nikarin xwe li çareserkirina wê pîrsa mezin ku çarenivîsa pitir ji 40 milyon însana ye, gêl û bêhay bikin. Ji ber ku ew dewletane dê bikevîne ber rexeneya raya navneteweyî. Em dizanin ku ew dewletên ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine, nikarin îro rojê di siyaseta derve de jî stîratêjiya îzolasyonê pêrew bikin û bimeşînin. Ji ber ku hemû welat îro rojê girêdayî hev in.

**- Gelo di hundirê welat de, çalakiyên we yên civakî, siyasî û sivil hebûn?**

Belê. Mixabin ji ber ku desthilat li Îranê midehê 30 salan e di destê rejîma dîktator û azadîkuj a Komara Îslamî de ye, hemû xebat û çalakiyên sivil, civakî û çandî ên serbixwe bi çaveke ewlekariyê tê dîtin û derfeta van cure çalakiyên serbixwe gellek kêmtir û bertesk e. Bo nimûne, dema me dixwast salvegera kîmyabarankirina Helebçeyê bibîr bînin, gellek asteng bo me pêk dianîn û bi taybet diviya bername kêmtir bi zimanê Kurdî ban, hêcet dianîn û kosp diafirandin. Lê niha li Kurdistanê serbarê, gef, girtin, îşkence, îdam û awayên din ên serkutkirinê, çalakên sivil û civakî û mafê mirovan xebata xwe dimeşînin û herdem jî digel zext û girin û îşkencê rûbirû dibin. Mînaka wê, derkirina biryara îdamkirinê û cezayên giran ên girtûgehê ji bo dehan rojnamevan, çalakên sivil û siyasî ên Kurd di Kurdistanê Îranê de ye.

**- Serkut, girtin û bi giştî bînpêkirina mafê mirovan di her warî de li Kurdistanê Îranê ji aliyê rejîma Îslamî a Îranê dom dîke, çima Komara Îslamî ew qas zext û givaşê ji çalakên sivil, xebatkarên mafê mirovan, rojnamevan û nivîskaran û... re tîne?**

Em dizanin ku ewa hezaran sal e, gelê kurd ji aliyê welatên dagirker ve di bin zilm û zoriyê de ye. Parastina kultûr û ziman ji aliyê xelkê kurd ve bi xwe mezintirîn çalakî di warê civakî û siyasî de ye. Rewşa Kurdistanê wisa ye ku her kurdek gava mezin dibe û hest bi wê zilm û zordariyê dike, bona ji holê rakirina wê zilm û zoriyê hewlê dide û ew jî bi xwe xebata siyasî ye. Her takek kurd heta ku Kurdistan rizgar nebe, kesek siyasî ye û piştî wê jî qonaxek din dest pê dike. Lê eger em bixwazin bas



ji xebata siyasî bi awayekî rêxistinî bikin, ewa tiştek dinê ye.

**Ji bo hişyarkirin û agahdarkirina raya giştî a cihanê, nemaze sazî û dezgehên demokratîk û mirovhez ên navneteweyî li ser rewşa xirab a bînpêkirina mafê mirovan û girtin û zîndanîkirina çalakên sivil û civakî divê çî xebat bînin kirin?**

Serkut, bînpêkirina mafê mirovan, girtina xebatkarên siyasî û sivil xisletê her rêjîmek dîktator e. Ew sistema ku tê de biryar hemû bi destê yek kesî be û xwe bi serperestê hemû xelkê welat bizane, xuya ye ku karbidestên sistemeke wiha tab û tehemûla bihîstina bîr û rayên cuda nakin. Dikarin bêjim ku di her sistimekê de ku tolêrans çî nebe, dê girtin, îşkence û kuştin jî hebe. Ji ber ku mezintirîn dijminê sistemeke dîktator, ronakbîr in. Ew çalakvanên mafên mirovan, rojnamevan yan xwendekarên ku tên girtin, kesên rewşenbîr in û di çarçova fikr û ramanên rêjîmê de nafikirin. Ji aliyê din, eger em mêze bikin, givaşek zaf li ser kurdan heye. Ew givaş jî her dizivire ser wê yekê ku kurd siyaseta û fikrên rêjîmê napejirînin. Her ewa ku kurd xebata netewî didomînin, tê wê manayê ku kurda îdeolojiya rêjîmê qebûl nîne. Ji ber ku ewa rêjîmek dînî ye û di têtolojiya wan de tiştek bi navê netewe manayek tune ye. Ew hemû xelkê dinyayê li ser du beşan parve dikin- misilman û xeyrî misilman. Di rastî de jî ew dîtin û nêrînek şovînistî û paşverû ye. Her sistemek jî ku li ser bîngeha rêzgirtin ji kerameta mirovan ava nebibe, li kuştin, bîrrîn û talankirinê jî natirse.

**Wekî xwendevanekî Agirî, gotina we ya dawiyê...**

Spas bona dana vê derfetê ji bo min. Agirî beşek ji xebata çandî bona parastina zaravê Kurmancî weke zaravek sereke ye zimanê Kurdî ye ku di Îranê de qedexe ye. Karê we pîroz û hêja ye.. Hêviya serkevtinê ji bo we dixwazim.

## YCDKÎ Pêncemîn Kongreya Xwe Lidar Dixe

**R**oja îne, 10.04.2009'an, demjimêr 9'ê sibê, heştêmîn

civîna Komîteya Rêveberiya Giştî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê li bin navê "ber bi kongirya pêncem", bi beşdariya endamên rêveberî û cîgir û şewirmendên wê yekîtiyê hate lidarxistin.

Rêveberiya giştî a YCDKÎ di vê civînê de daxwazê ji hemû xelkê Kurdistanê,



hemû alîgir û dostên xwe dike ku ber bi bangewaza wê yekîtiyê bona lidarxistina pêncemîn kongireyê biçin û di vê derheqê de rexne û pêşniyarên xwe derheq kongire û erkên wê (pêdeçûn bi ser bernamê û pêrewa saziyê) bo rêveberiya giştî ya YCDKÎ re bişînin.


## Di Encama Teqîna Mayînekê De Du Kes Bûne Qurbanî

**Ş**eva 06.04.2009'an, çend kasibkarên Kurd li devera

Mirgawer ser bi bajarê Urmiyê, ketine nav meydana mayînan.

Bi sedema teqîna mayînekê kasibkarek bi navê Riza, xelkê gundê Holistane, jiyana xwe ji dest da û kasibkarek din jî yê xelkê gundê Nowê birîndar bû.

Kuştin û birîndarbûna xelkê akinciyên deverên sersînoren parêzgehên Kurdistanê bi taybetî parêzgeha



Azerbaycana Rojava û Kurdistanê di demekê de ye ku berpîrsek têkildar yê rejîma Îslamî a Îranê ragihandî ye, paqijkirina meydana mayînan di parêzgeha Azerbaycana Rojava de bi dawî hatiye. Di salê de sedan kurd li gund û bajarên rojhilatê Kurdistanê de dibin goriyên teqîna mayînan.

## Zêdetirîn Qaçaxçiyên Jin Û Keçên Cîhanê Jin In

**L**i gor nûçeya Ajansa Nûçeyan a "Fars"ê, navenda xebat li dijî madeyên sirker û cezayan a ser

bi Saziya Neteweyên Yekbûyî, rapora herî nû derheq qaçaxa jinan û keçan li cîhanê ragihand. Li gor rapora han zêdetirîn qaçaxçiyên jin û keçên cîhanê jin in.

Pêka rapora Ajansa Nûçeyan a "Fars"ê, qaçaxa %79 ji mirovan bi armanca destrêjyên zayendî tê encamdan û goriyên yekem di vê



derbarê de jin û keç in. Lê xala herî balkêş di rapora han de eva ye ku di 30 welatên ku tê de lêkolîn derheq zayenda(nêr, mê) qaçaxçiyên hatiye encamdan, jin zêdetirîn hejmara qaçaxçiyên pêk tînin. Bi wateyek din tawanbarên jin rolek berçav di qaçaxa mirovan de hene. Di Ewropaya Rojhilat û Asiyaya Naverast de, %60 ji kesên mehkûmbûyî bi qaçaxa mirovan jin in. Li gor rapora han, Antuniyû Mariya Kasana, birêveberê deftera xebat li dijî madeyên hişber û cezayan a ser bi Saziya Neteweyên Yekbûyî dibêje: Di herêmên han de qaçaxa jinan û keçan bi destê jin kiryareke asayî ye.

Pirsa herî balkêş eva ye ku goriyên qaçaxa jinan bi xwe dibin qaçaxçiyên jin û keçan.

## Ronak Sefazade Bi 6 Sal Cezayê Girtîgehê Hate Mehkûmkirin

**Agirî:** li gor nûçeya malpera "we-change"ê, Mihemed Şerîf parêzerê Ronak Sefazade, çalaka mafê jinan ragihand ku navhatî ji aliyê dadgehê ve bi şeş sal cezayê zîndanê mehkûm bûye û ji tometa Muharibe(şer tevî Xwedê) hatiye beraetkirin.

Bi gotina Mihemed Şerîf, çalaka han ya mafê jinan bi tometa endametiya yek ji rêxistinên kurdî bi pênc sal cezayê girtîgehê û bi sedema çalakiya propagandayî li dijî rejîma Îslamî a Îranê û bi qazanca rêxistina han, bi yek sal cezayê zîndanê hatiye mehkûmkirin. Şerîf got ku li hember wê biryarê nerazîbûna xwe nîşan daye daku di dadgeha pêdeçûnê de biryara dawiyê di vê derheqê de bihê dayîn.


Hêjayî gotinê ye ku Ronak şalakeke mafê Jinan e û endamê 2 rêxistinên marên jinan e û di wan saziyan de xebitiye û nêzik 2 sala ye ku di girtîgehê de ye. Bi vê biryarê dê 6 salên din jî di girtîgehê de bimîne.





## BERPIRSIYARIYA MIROV

ADAR JIYAN  
adarjiyan@mynet.com



**B**êguman daxwaza her mirovî/ê ew e ku di civakeke hêmin, şadîman, lihev û aştîbûyî de bijî. Belê ne mimkun e ku her gav ev daxwaza mirov were cî an jiyân li gora dilê mirov pêk were. Divê mirov têkiliyên xwe li ser hîmê fedekarî û qenciye dayne û merc û derfetên xwe ji bo jiyaneke azad, aram û bextewar seferber bike.

Îcar heta ku mebest û feraseta mirovan li ser hîmê rastî û duristiyê neyê danîn û mirov bi hestên aştiyane tevnegerin, zêde ne mimkun e ku tu pêwendiyên li hev, azad û aştiyane pêk werin. Û heta ku takekes û civak jî pêwendiyên xwe li gora wekhevî, yeksanî, hezkirin, rêzdayin û giramiyê daneynin, ne mimkun e ku aştî û azadî bibe para mirov û mirovahiyê.

Sûketin, xeydandin, şer û pevçûnên navbera mirovan ne tişteki jênager an rêbazeke neguherbar ya civakî ye. Di bingeha van tiştan de perjewendiyên çend kesên/hêzên mêtînger heye. Ji bo mirovan karesata herî mezin çavbirçîtî û mêtîngerî ye. Mixabin, mêtîngerî îro wekî hêzeke diyarker rola xwe dileyîze. Û dîsa mixabin têkiliyên navbera mirovan jî ji aliyê vê hêza bêxêr, bêkêr, bêsinc û xêrnexwaz de teşe digire. Belê dîsa jî mirov dikarin pevte têkiliyên germ û jidil daynin û bi rêxistin, rêzgirtin û piştevanî tev bigerin. Bi vî awayî dikarin vê pergala yekzoran û yekalî lialî bikin û cîhaneke serbixwe, azad û hevpar diyarî peyrwên xwe û diwaroja mirovahiyê bikin. Dîsa jî têkiliya mirov a herî girîng û watedar, têkiliya wî/ê ya bi xwe re (xwe bi xwe) ye. Carekê, divê ku mirov bi xwe re bikeve nav têkiliyê erênî. Ango divê pêşî bi xwe re li hev be; peyre têkiliyê bi derûdor, civak û cîhana ku tê de dijî re dayne. Divê alavên têkiliyê yê ku mirov di dest xwe de digirin bi awayekî sîdewar û erênî bixebitînin. Bêguman alavên têkiliyê, di heman demê de alavên hilberîne ne jî. Divê mirov van alavan ne ji bo şer û pevçûnê; ji bo aştî, yeksanî û şarezahiyê bikar bînin. Di derbarê vê yekê de perwerdekar û mirovhezê navdar Leo Buscalia dibêje " Ji bo ku hûn wêneyekî çê bikin, li ber destê we hin alav hene. Hûn dikarin bi wan alavan hem wêneyê dogehê hem jî yê bihûstekê çê bikin. Belê ew di destê we de ye." Rast e mirov dikare alavên hilberiyê hem ji bo cîhaneke dogehî, hem jî ji bo cîhaneke bihûstî bikar bîne. Çendî ku alavên hilberiyê di destê serdest û

kedxwaran de bin jî, dîsa mirov dikare tenê alavên ku di destê mirov de ne, di riya avakirina bihûstekê de bixebitîne û bikar bîne. Ango, bi qandî ku mirov dikarin cîhanê li hev û din bikin agir û dogeh; dikarin jiyane li hev û din bikin bihûş jî. Ya çê ew e ku dikaribin li şûna dojeheke dadayî, bihûsteke rengîn biafirînin; tê de rûnin û bi hev û din şa bibin

Mirov dikarin çî bikin ?

Mirov dikarin pêşî bi xwe re paşê bi malbat, xizim, cîran, dost û hevalên xwe re li hev bin û li dijî neqenc û dilxerabên dinê bibin yek. Mirov dikarin li dijî dijminê mirovahiyê rawestin. Mirov dikarin, berjewendiyên xwe yê biçûk û kesane fedayî yê mezintirîn û fedayî mirovahiya cîhanê bikin. Mirov dikarin pevte bikenin û ji dil û can silavê li hev û din bikin. Mirov dikarin di her warî de, li gora merc û derfetên xwe alîkariya hev û din bikin. Mirov dikarin, ji xeynî kedxawar û xwînxwirên dinê; bi hemû mirovan din re bidin û bistînin. Mirov dikarin ji bilî radest û mijokdarên cîhanê, ji hemû mirovên din hez bikin. Mirov dikarin li hev û din guh bidêrin. Mirov dikarin, çendî ku ne pejrînin jî rêzê ji ol, bawerî û fikr û ramanên hev û din re bigirin û hev û din tehmûl bikin. Mirov dikarin her gav li şûna neyîniyên hev, cara caran erênîyên hev û din jî bibînin. Dîsa mirov dikarin, hev û din rûmetdar bikin û bipesinînin... Û mirov dikarin gelek tiştên din ên baş jî bikin.

Mirov dikarin çî nekin ?

Mirov dikarin hevûdin nekujin. Mirov dikarin hevûdin neêşin. Mirov dikarin dilê hev û din nehêlin û hev û din nexeyidînin. Mirov dikarin paşgotina hev û din nekin. Mirov dikarin li ser tişteki beredayî ji hev û din nedexisin. Mirov dikarin derew û durûtiyan nekin. Mirov dikarin xwe di ser hev û din re nebînin. Mirov dikarin hev û din biçûk nebînin. Mirov dikarin hev û din zivêr nekin. Mirov dikarin qeşmeriyên xwe bi hev û din nekin. Mirov dikarin neheqiyê li hev û din nekin. Mirov dikarin fesadiya hev û din nekin. Mirov dikarin bêbextiyê li hev û din nekin... Û mirov dikarin gellek tiştên din yê xirab jî nekin. Ji bo ku mirov bikaribin van tiştan bikin an nekin jî divê pêşî xwediyê bîrdoz, raman û feraseteke tekûz, zanistî û mirovî bin. Belê ev yek jî her gav pêjînkari, hestiyarî û fedakariyê dixwaze.

Kaniya Helbestan

Pêlek Eşqê

Dildar Îsmail



Dilê helbestên min in

ev kaniyana

heyva min ya ciwan

wek karwanekî

westiyayî

diçe û tê

rêç jêre ez im

ev ewrên avis

xak û xak diçin

pêre yek in

xwe dadihêjn

kûrahiya daristana min

ew min himbêz dikin

û ez wan himbêz dikim.

Ta ji wan tê

li ser min

dibarînin barana xwe

ez aşîqa sirûştê me

min xwe sipartiyê wê

hemû demar

min ji bo wê vekirin

şanên min miştin

bi evîna wê

eşq û evîn

dilûvan min de

dicilqin

wek pêlek dyn

wek helbestekê.

# Cegerxwîn Û Kovara Gulîstan\*




## Konê Reş Qamişlo

Piştî rawestandina herdu kovarên Mîr Celadet Bedirxan Hawar:1932-1943'an û Ronahî:1942-

1945'an de, pêûsên ku ew kovar bi berhemên xwe dagirtin bi rola xwe rabûn. Erê, ewên ku naveroka kovara Hawar û Ronahî bi nivîsên xwe dixemilandin û wek şagirtên mîr Celadet Bedirxan tên naskirin mîna: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Dr. Nûrdîn Zaza, Mele Ehmed Namî û Reşîdê Kurd û gelek kesên din..

Lê mixabin, piştî ku kovara Hawar û Ronahî hatin rawestandî, gelek kesan ji wan rawestên û helbestvanan, dûrî karê wêjeyî ketin û dest bi karê siyasî kirin. Hin ji wan, ji ber tirsê û qedexebûna zimanê kurdî û hinan jî ji ber feqîrtiyê û ji bo bidestxistina gepa nanê rojê dûrî



ferheng û wêjeyê kurdî ketin..

Lê Cegerxwîn, ji ber akama êş û birînen miletê xwe, bi berdewamî di afirandina xwe de kar kir û bi wêrebûn, bê tirs û bê saw meşiya.

Di sala 1968'an de, seydayê Cegerxwîn hevil da ku bixwe wê valahiya rawestandina kovara ( Hawar û Ronahî ) yê dagire û wiha piştî 23 salan ji bêdengiyek wek mirinê di ser zimanê kurdî re, dest bi weşandina kovareke xurû kurdî, bi tîpên latînî kir, bi navê **Gulîstan**.


Li ser weşandina Kovara Gulîstan, min di roja 07.04.2008'an de ji berêz mamoste Hemîdê Derwêş, Sekretêrê Partiya Dîmoqrâtî Pêşverû Kurd li Sûrî pirsî, (yê ku Cegerxwîn endamêkî vê Partiyê bû) birêz Derwêş wiha got; "Cegerxwîn doza weşandina kovareke kurdî bi navê Gulîstan kir, hingê min jê re got: Bila nav Stêr be, lê Cegerxwîn razî nebû û wek xwe kir... Wî kovara Gulîstan diweşand.. Me wek Hizib her tişt jê re amade kir, dektîlo, kaxez... Me gelekî guh dida ziman. Kekê ! Di wan salan de em di rewşeke pirr dijwar de derbas dibûn.. Hevalên me di zîndanên de bûn, em revyayî bûn, ew derfeta xweş nebû.. Me dixwest em gellek tiştan bikin.."

**Gulîstan:** Li ser bergê hejmara Dawî(37), Sibat 2008 Pênasîna kovarê wiha hatiye nivîsandin: **Kovarek Wêjeyî û Civakî ye**, Lê li ser bergên hejmarên pêşîn manşeta pênasîna kovarê wiha hatiye nivîsandin; **Kovarek toreya û edebî ye**. Hem jî **Kovarek Toreyanî û Civakî ye** !. Hem jî ev gotina Cegerxwîn li ser tev hejmaran heye, kevin û nû:

**Ev kovar kovara te ye  
Ev bax û gulîzara te ye  
Têde darek xweş biçîne  
Ev dar nivîsara te ye.**

Piştî koçkirina seydayê Cegerxwîn, ev manşet li ser tev hejmaran tê nivîsandin:

**"Di sala 1968' an de Cegerxwîn kovara Gulîstan weşandiye û bûye**



## berpirsiyarê wê'.

Hejmara pêşîn ji vê kovarê di meha Nîsana sala 1968'an de hatiye weşandin, serkêşiya wê seydayê Cegerxwîn dikir. Hejmarên pêşîn ji 12 rûpelan ta bi 24 rûpelan bûn, li ser û pelên A4, bi bironyo dihat kişandin.. Naverok bi helbestên Cegerxwîn dihat xemilandin. Hejmara dawîn( 37 ) ji vê kovarê di Şibata 2008'an de derketiye. Piştî koçberiya Cegerxwîn ber bi Swêdê ve, ev kovar ketiye nav gellek destan de, di pey Cegerxwîn re mamoste Ezîzê Dawê bi kar û barên wê rabûye, piştî çend salan, rehmetî Ferhadê Çelebî ev kovar bi reneki nû weşandiye, di pey Ferhad re, mamoste Salihê Heydo bi berpirsiyariya çend hejmara rabûye û roja îro wek ku ez dizanim, mamoste Selmanê Heso berpirsiyariya vê kovarê dike.

Bi hilkevta 111 saliya rojnamegeriya kurdî, vê gotarê dikim diyarî ji giyanê helbesvanê netewî Cegerxwîn re.

## Pêşangeheke Nîgarkêşanê Ji Bo Du Ciwanên Nîgarkêş Hate Lidarxistin

**A**girî: roja 14.04.2009'an, pêşangeheke nîgarkêşiyê ji bo du ciwanên nîgarkêş bi navên Hêriş Abidî û Evîn Mistefazade, di hola giştî a rê û resmên PDKÎ de ji aliyê girûpa hunerî a PDKÎ ve hate lidarxistin.

Di destpêka pêşangehê de Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ û çend

endamên Deftera Siyasî û rêberiya wê partyê beşdar bûn.

Çeko Rehîmî, endamê Komîteya Navendî a PDKÎ, pêşangeha han vekir û pêşangeh û berhemên wan du ciwanan ji aliyê beşdaran ve bi germî hate pêşwazîkirin û bi berhemên xwe yê balkêş beşdar heyrî hiştin.

Hêjayî gotinê ye ku pêşangeha han pênc rojan dom kir.



## 22'ê Nîsanê Cejna Rojnamevaniya Kurdî

**L**i 22-ê Nîsana sala 1898'an, xebatkarê Kurd ê mezin, lawê mîrê Cizîra Botan, rewşenbîr û zanayê nemir **"Miqdad Midhet Bedirxan"**, di dîroka gelê me ya nûjen de yekemîn car, rojnameyek bi zimanê Kurdî û tîpên Erebî bi navê KURDISTAN li paytexta Misrê (**Qahîrê**) weşandiye.

Xwedî û berpirsiyarê rojnamê, armancên xwe bi zelalî di hejmara pêşîn de destnîşan kirine, daye zanîn ku zimanê Kurdî, ji zimanê gelên dever û yên cîhanê ne qelstir û ne kêmtir e, rojname, kovar û pirtûkên cûr bi cûr dikarin pê bêne nivîsandin, çapkirin û weşandin. Herweha, wî eşkere kiriye ku ewê di warê zanîn, aborî û huneran de şîretan li Kurdan bike, dibistan û zanîngehên baş li her kuderê hebin, wan nîşanî Kurdan bide, heya ku ew zarokên xwe bişînin wan dibistanan, zanîn û huneran jê wergirin.

Lê, sed mixabin ku **Sultan Ebdilhemîd** ê xwînrêj digel şêwirdarên wî yên bê ol û bêbext mîna **"Abu Alhuda"**, zor dane xwediyê rojnamê, da ew weşana wê ji ser xaka dewleta **Alî Osman** rawestîne. Piştî rawestana kurtedemekê, rojnamê cihê weşana xwe ji **Qahîrê** veguhestiyê **Ewropayê** û jiyana xwe berdeham kiriye. Lêbelê, diltengî û zikreşiya **Sultanê Ebdilhemîd**, sînoren dewleta wî derbas kiriye, hewil daye ku destên xwe yên gemar dirêjî qirika rojnameya Kurdistanê bike, da wê bifetîşîne, dengê wê bibirîne û Kurd bi tenê li vê cîhanê bê rojname, kovar û pirtûk bijîn û bêdeng bimînin...!!Lê, her û her, rojnama me ya pîroz li ber xwe daye, xwe ji ber tîrên mirinê daye alî û xwe parastiyê, tîrêjên zanîne li Kurdistanê belav kiriye.

Bê goman ku fermana **Sultan Ebdilhemîd** derheq qedexekirina derçûna rojnameya Kurdistan ya berî 111 salan, fermaneke çewt û nemirovane bû. Lê, ji wê demê ta niha, cîhana me ya nûjen gelek bûyerên dilêş û guhertinên mezin di hemî warên jiyane de dîtine. Du şerên cîhanî yên malwêran rû dane, bi dehan milyon mirovên bê sûc û bê guneh bi agirê wan hatine şewitandin!! Herweha, derdora 70 salî, şer û nakokî di navbera enî û rista dewletên sosyalîst û dewletên sermiyandar de berdeham kiriye. Li her çar kenarên



gerdûnê mafên mirovan talan û bînpê bûne. Piştî herdu cengên giran, û ji bo ku mafên mirovan li seranserê cîhanê bê parastin, Rêxistina **Netewên Yekbûyî (UN)** hatiye damezrandin, mafê hemî gelan bi şêweyekî fermî parastiyê. Herweha, di warê pîşesazî, têkildarî û ragihandinê de jî, cîhanê gavên fireh û balkêş avêtine, pîrensîp û nirxên nû hatine afirandin. Ango, mirov dikare bibêje, sembol û navnîşana vê sedsalê rêzgirtin û parastina mafên gelan û mirvan e.

Vêca, di siya evqas guhertin û

bûyerên dîrokî de, çêdibe ev destelatên ku îro gelê Kurd di bin destê wan de ye têkiliyê bi pîrs û zimanê Kurdî re mîna têkiliya **Sultan Ebdilhemîd** bikin û ew belge û biryarên rêxistina **Netewên Yekbûyî** bînpê bikin û qedexekirina zimanê Kurdî bidomînin?!!. Ma li gora kîjan zagonê ew rejîm xwe di çewisandina zimanê Kurdî de mafdar dibînin?!!

Li welatê **Sûriyê** jî, hîna siyaseta qedexekirina zimanê Kurdî berdeham e, rejîma Sûriyê, li rastiya hebûna derdora 3 milyon Kurd ku lê dijîn mukur nayê, bi tundî şerê ziman, folklor û wêjeya Kurdî dike, zimanzan û çalakvanên zimanê Kurdî ceza dike û hewil dide ku vî zimanî ji holê rake. Ew ji bîr dike ku zimanê Kurdî li dirêjîya sedsalan, rehên xwe di hiş û dilê gel de kûr berdane, tu hêz nikare wî ji hiş û dilê gel derîne.

Bi vê boneya pîroz, em hemî rojnamevan, xwendevan, nivîskar, helbestvan, romanîvîs û rewşenbîrên Kurd pîroz dikin. Hêviya me ew e ku her ew li ser riya hîmdarê rojnameya Kurdî **Mîr Miqdad Midhet û Mîr Celadet Bedirxan** bi xwîna dilên xwe qelaştine berdeham bin, li zimanê Kurdî yê şerî xwedî derkevin û berevaniyê ji hebûn û xizmeta pêşvebirina wê bikin. Gurzek gulên rêzgirtin û emegdariyê ji giyanê pak yê **Miqdad Bedirxan** û hemû **Bedirxaniyan** re!. Gurzek gul ji hemî xebatkar, çalakvan û nivîskarên zimanê Kurdî re!.

**Komîta Rêvebir a Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ)**

15.04.2009Z-2621K

### Bîjen Kamkar Nikare Tevî Koma Muzîkê A Xwe Beşdarî Festîvala Hunerî Li Ebûzebiyê Bibe

► Çavkaniyek nêzik ji Koma Kamkaran li Tehranê bi malpera sibeyî ragehand ku hunermendê sitranbêj û muzîkjenê xwedî şiyar (Bîjen Kamkar) endamê koma muzîkê a kamkaran, bi hegera nexweşiya qirikê, careke din bo nexweşxaneyê pars ji bajarê Tehranê ve hate şandin û niha di bin zêrevaniya nojdarên de ye û bi vê hegerê jî rege (Bîjen kamkar) nekare tevî koma xwe li festîvala navneteweyî a (Cîhana muzîk û dansa Fumed) ku li bajarê Ebûzebî a ser bi welatê Îmaratê ku di 2'ê vê heyamê de tê saz kirin, beşdar be.

Vê çavkaniyê herwisn da eyankirin ku: heger bê û saxlemiya navbirî baş nebe, divê ser jinû neştergerî (emeliyat)jêre bihê kirin.



## 8 Sal Cezayê Girtîgehê Ji Bo Roksana Sabirî Hate Birrîn

► Roja şemî, 18.04.2009'an, Parêzerê Nûçegihana Îranî Amerîkayî, Roksana Sabirî ragihand ku dadgehekê li Tehranê ew keça nûçegihan bi tawana sîxorî ji bo Amerîkayê bi 8 sal cezaê girtîgehê hate mehkûmkirin.

Roksana nêzîk 3 mehan berî niha li Îranê hate binçavkirin û ji bo girtîgehê Êvînê hatibû şandin.

Sabirî ku ji bavek Îran û



dayikek Japonî li Amerîkayê hatiye dinê û ji 6 salan berî niha ve bo karê nûçegihaniyê serdana Îranê kiriye. Wê li Îranê weke nûçegihan ji bo BBC û Radyo NPR a Amerîkayê xebitiye.

## Çalakekî Kurd Yê Mafê Mirovan Bi Salek Cezayê Zîndanê Hate Mehkûmkirin

► Nûçegihaniya Çavdêr ya mafê mirovan li Kurdistanê ragihand ku Saman Resûlpûr, rojnamevan û çalakê mafê mirovan, ji aliyê Taya 1 a Dadgeha Şoreşa bajarê Mehabadê ve bi tomata propaganda li dijî rejîma Îslamî a Îranê û jirê derkirina birî û hizra giştî, bi rêya hevpeyvîn tevî ragihandinên derve, bi 1 sal



cezayê girtîgehê mehkûm bû.

Hêjayî gotinê ye ku Saman Resûlpûr piştî binçavbûnê di meha Tabaxa 2008'an de û piştê givaşa organên Ewlekarî bo ser wî, neçar bû ku welatî bi cî bihêle û biryara cezakirina navhatî bêt wî hatiye derkirin.

## Tendurustiya Hunermendê Bilûrvan Qadir Abdulazade Pirr Xirab E

► Li gorî agahiyên ku gihîştine Agirî, rewşa tendurustiya hunermendê bilûrvan ê Kurd Qadir Abdulazade, naskirî bi Qale Mere pirr xirab e û ew di nexweşxaneyê bajarê Bokeranê de di bin çavdêriya xurt a bijîşkî de ye.

Mame Qale zêdetirî 30 salan e ku bilûrê lêdixê û li Rohhilatê Kurdistan bilûrvaniya wî bi nav û deng e û ji aliyê gel ve gellek tê hezkirin.



## Toşîba û Sonî Erîksonê Nêzîk 4 Milyar Dolar Zîrar Dîtiye

► Ji ber kirîza aborî a cîhanê, her du şirketên mezin ên elektoronîk ên cîhanî "TOSHIBA" û "SONY ERICSSON" hezaran kedkarên xwe der kirin.

Şirketa Japonî a Toşîbayê ragihand heta meha Adara 2010'an dê hejmara karkerên xwe bo 3900 karmendan dabêzîne, eva jî eşkere kir ku bi sedema kirîza



aborî a cîhanê, kompaniya wan sê 3/5 milyar Dolar zîrar dîtiye û çavniherî tê kirin qasê zirara wan zêdetir jî bibe.

Şirketa "Sony Ericsson" a Birîtanyayî jî diyar kir ku ji ber vê sedemê, di sê mehên yekem ên sala 2009'an de, 385 milyon Dolar zîyan li şirketê wan ketiye û heta niha 4 hezar kedkarên xwe der kirine.

Van da zanîn, ji ber kirîza aborî a cîhanê, xelk bi kêmiyê dikarin berhemên wan, nemze telefonên destan (Mobile) bikin.

## Dehan Kes Ji Çalakekên Karkerî Yê Kurd Li Bajarê Sine Hatî Girtin

► Roja îne, 17.06.2009'an, dehan kes ji çalakekên karkerî ên Kurd û endamên malbatên karkeran, li bajarê Sine ji aliyê hêzên ewlekarî yê rejîma Îslamî a



Îranê ve hatin binçavkirin. Li gor nûçeya Civata berevanîkirin ji girtiyên siyasî û mafê mirovan li Îranê, hêzên Ewlekarî ên rejîma Îslamî a Îranê roja îne, êrîş kirin ser mala Xalib Husênî ku cihê civîna çalakekên karkerî bû û çalakekên karkerî dane ber lêdan û kutanê. Hêzên han tiştên nav mala Xalib Husênî têk dan û belgenamêyên taybetî yê navhatî tevî xwe birin.

Her wiha hêzên Ewlekarîyê kolan û şeqamên nêzîkî mala Xalib Husênî dorpeç kirin û dest dane azar û ezîyetkirina xelkê. Li gor çavkaniya han, di wê êrîşê de 50 kes hatine binçavkirin. Lê Komîteya Hevahengî bona alîkarîkirin bi rêxistinên karkerî ragihand ku nêzîkî 100 çalakekên karkerî di wê malê de hatine girtin. Heya niha çarenivîsa kesên binçavkirî ne rohn e. Komek ji malbatên girtiyan serdana binkeyên polîsan û Îdareya Ewlekarîyê kirine û daxwaza azadiya girtiyan kirin, lê tu bersiv wernegirtine.